

ÇAVKANÎYÊN RÛSAN DI DERBARÊ MEDAN DE

Dr. İsmet Konak



Dema qala dîroka Asyaya Piçûk û Kafkasan dibe, yek ji gelên herî kevnare ku tê bîra mirov jî Med in. Pêvajoya avabûna dewleta Med, karakterên wê yên etnîkî û akûbeta wê salên dirêj in di cîhana zunistê de tê axaftin. Bi taybet jî, mijara girêdana Zerdeştî û etnoya kurd bi serdema Medan ve heye an na, di navenda van gotûbêjan de cî digire. Li gor hinken Zerdeştî di serdema persan de derketiye holê û girêdaneka wê bi serdema Medan re nîne. Li gor hinekan jî "peyamberî"ya Zerdeşt xwe dispêre serdema Medan. Dîsa li gor hinek lêkolîneran Medî, bi tu rengî ne rah û mînaka kurdan in. Li gor komeka din jî dîsa, di navbera her du dînamîkan de avabûn angû girêdaneka "monofiletîk" (kom, gel û civakên ji heman bavikî hatine, li ser heman rahî şîn bûne) heye.

Di vê gotarê de em ê li ser bingeha hinek lêkolînên di serdemên Çarîtiya Rûsyayê û Yekîtiya Sovyetê hewl bidin fenotipeka dewleta Med derxin. Bi taybet jî em ê li ser Zerdeştîyê û hemêtnîkiya (etnîsît) netewa kurd bi medan re hûr bibin.

I. Bingeha bêjeya Med

Dema em li qada rûsyayê li lêkolînên li ser bingeha an jî etîmolojiya bêjeya Med dinêrin, beriya her tiştî em rastî hinek lêkolînên V.F. Minorskiy tîn. Minorskiy, ku çavkaniyên asûran weke bingeha digire, dibêje, ku di sala 836an a B.Z. de rastî navê "Mada" ten. (Minorskiy, 2013, r. 206–211). Dîsa Mînorskiy dide zanîn, ku di hinek dokumantên Asûriyan de, tê dîtin ku sala 844an a B.Z. de, di derbarê persan de rastî gotina "Parsua" hatye. Minorskiy wisa Bawer dike ku Pers û Med xizmên hev in. (Minorskiy, 2013, r. 206–211). Mirov di lêkolînên rojhilatzanê sovyetî V.V. Struve de jî hin tespîtên nêzî nêrînên Minorskiy dibîne. Dîrokzan Struve dide zanîn ku çavkaniyên Asûriyan di sedsala IX a B.Z. de qala rêveberên Medîyan dike, lê wê demê hîn tu dewlet danemezirandine. (Struve, 1941, r. 367). Dîsa bi heman şêwazî lêkolînerê sovyetî O.I. Vîlçevskiy dinivîse ku di çavkaniyên asûran de hinek epîtetên mîna "Maday dautî (Medên bi hêz)" û "Maday rukutî (Medên dûr)" hene. (Vîlçevskiy, 1961, r. 49). Herwiha lêkolînerê rûs Î.M. Dyakonov dide zanîn ku bêjeya Med di êlamiya nû de wek "mata", di îbraniya kevin de wek "madaj", di farisiya kevin de wek "mâda", di yûnaniya kevin de wek "medoî/mâdoî" hatiye bikaranîn (Dyakonov, 2012, I, r. 165). Dîrokzan Îgrar Alîyev jî, di nav çavkaniyên ermenan de li dû şopa vê bêjeyê ketiye. Dîrokzanê ermen Moses Xorenatsî jî dema qala Medan dike dinivîse ku ew ji bêjeya "mar" sûtê werdigire û koka vê bêjeyê jî xwe dispêre bêjeya "mada" ya zimanê partî. (Alîyev, 1960, r. 70). Yek ji lêkolînerê li ser etîmolojiya bêjeya Med lêgerîn pêk ane jî, Nîkolay Marr e. Zimanzan Marr, pêşdibîne ku ev bêje di transformasyoneka wiha re derbas bûye: "mard>mad>mîd>med" (Nîkîtîn, 1964, r. 365).

II. Damezirandina Dewleta Medan

Beriya Medî derkevîne ser dika dîrokê, li herê mê gelek dînamîkên etnîkî hebûne. Xorrî¹, Mîttanî, Kassîtî, Êlamî², Lûlûbî/Lûllûbî/Loloyî, Mûşkî/Moskhî, Sûbarrî/Sûbartî, Gûtî/Kûtî (Avdîyev, 1970, r.61) û tê zanîn ku Mannayî jî li heman herê mê jîyane û hinek dewlet jî ava kirine. (Dyakonov, 2012, I, r. 108–109). Wisa tê bawerkirin ku di navbera van beşên etnîkî de, di warê zimên (înguîstîkî) û çandê de girêdanên mezin hene. Bi taybet jî Manna yê ji koka Lûlûbî-Kûtî'yan hatine, bê guman ku li ser Medan yekser bandoreka mezin hiştine. Ji sedsala IX a B.Z. heya sedsala VI, Mannayî li herê mê desthilatdar bûne û bingeha çandî û aborî ya Medan ava kirine. (Dyakonov, 2012, I, r. 160–161).

Pêvajoya damezirandina dewleta Medyayê xwedî gengeşiyeye mezin e. Bi taybet jî kronolojî û navên desthilatdaran, ji aliyê lêkolînerên sovyetê ve bi berfirehî hatine nîqaşkirin. Loma jî berhema dîrokzan Îgrar Alîyev a bi navê "Dîroka Medyayê", balkêş e. Alîyev, dema li ser damezirandina Medyayê hûr dibe, daneyên du dîrokzanên yûnanî Ktêsîas (Ctesias) û Hêrêdotos dide ber hev. Li gor Ktêsîas, Medî 317 salan desthilatdar bûne, ango dewleta Medyayê sala 867an hatiye damezirandin û di sala 550an de jî xera bûye. Ktêsîas navên keyên Medan jî wiha rêz dîke: Arbak (Arbakos, 28 sal), Mandaûk (Mandaûkos, 50 sal), Sosarm (Sosarmos, 30 sal), Artîk (Artûkas, 50 sal), Arbîan (Arbîanes, 22 sal), Artey (Artaîos, 40 sal), Artîn (Artûnos, 22 sal), Astîbar (Astîbaras, 40 sal), Aspand (Aspandas/Astûîgûs, 35 sal). (Alîyev, 1960, r. 192; Dyakonov, 2012, I, r. 165). Lê Îgrar Alîyev pir bawerî bi vê agahiyê nayne û bi dîtina wî ew "li hev anîne". (Alîyev, 1960, r. 193). Li gor wî, agahiyên ku Heredotos dide, bêtir êmpîrîk in. Li gorî nêrîna Heredotos kurê Fraort (Phraortes) Deîoces³ di nav eşîra xwe de wek kesekî ku ji mafên mirovan re rêz digirt dihate zanîn (Alîyev, 1960, r. 190). Wî, di nav civakên Medî de ku bêqanûnî desthilatdar bû, pergalek ava kir û loma jî civakê jê bawer kir û ew di nav civakê de bû xwedî otorîte (Alîyev, 1960, r. 190). Bi dîtina Îgrar Alîyev, di nav zanyariyên Heredotos de, bi taybet di mijara kronolojîyê de hinek nakokî hene û di nivîsa encama hin lêkolînan xwe de dibêje, ku Deîoces li derdorê sala. 700î a B.Z. wek key hatiye hilbijartin, 6 eşîrên Medan li hev kom kiriye û dewleta Medyayê ava kiriye⁴.

Derbarê avakirina dewleta Medan de, di nav lêkolînan li Rûsyayê hatine kirin de, tê dîtîn ku ramaneka hevpar nîne. Li gor vê jî, rojhilatzanê rûsî V.F. Mînorskîy dide zanîn, ku Medan 175 salan desthilatdarî kirine, ango padişahîya Mediayê sala 725an a B.Z. hatiye avakirin (Mînorskîy, r. 206–211). Dîrokzanê din Î.M. Dyakonov jî, dîroka damezirandina dewleta Med sala 727an a B.Z. dide xuyan (Dyakonov, 2012, I, r. 165). Ew vê hîpoteza xwe, dispêre Hêrodotos. Lê ne zelal e, ka Hêrodotos zanyariyeka wiha dayem an – na. Hêrodotos, ê ku pêvajoya li ser text mayîna keyên Medan bi berfirehî vedibêje, dinivîse, ku Deîoces 53, Fraort 22, Keyaksar (Cyaxares/Kiaksar/Huvaxşatra/Uksitar) 40 û Astyages 35 salan desthilatdarî kiriine. (Herodotus, 2013, r. 47–60). Hêrodotos dide zanîn, ku di serdema Kîyaksar de Îskît 28 sal desthilatdar bûne. Hêrodotos vê pêvajoyê jî bi ser pêvajoya desthilatdariya 40 salî ya Keyakser ve vedike (Herodotus, 2013, r. 49). Lê dîrokzanê yûnanî di vê mijarê de agahiyên şaş dide. Ji aliyekê ve piştî pêvajoya

1 Lêkolîner û filologê rûs O.L. Viļčevskiy dinivîse ku êlên binecîh ên Xorriyan, di derketina holê ya nijada kurd de dikare roleka "substrat" listibin. Viļčevskiy herwiha angaşt pê dîke ku dikare di navbera Lûlûbîyan û kurdên Barzan de nêzikayîyek hebe. (Viļčevskiy, 1961, r. 10–11).

2 Kafkasolog û zimanzan Nikolay Marr ku derbarê Mûşkîyan de hin agahiyên kurt dide, angaşt pê dîke ku li gor nivîsên bismarî yê Akamenid/Ahmaniş, di navbera Medan û Elamiyan de, di wateya lînguîstîkî de girêdanek heye. (Marr, 1933, r. 310).

3 Di çavkaniyên rûsî de wekî "Deyok: Дейок" jî derbas dibe (Dyakonov, 2012, I, r. 196–197; Alîyev, 1960, r. 190).

4 Di rastiya xwe de dîrokzan Îgrar Alîyev wisa bawer dîke ku Heredot di hin dîrokan de şaşî kirine. Heredot dîroka damezirandina Medyayê wekî B.Z. 708 û dîroka xerabûna wê jî weke B.Z. 558 dide, lê Alîyev dibêje di van dîrokan de hinek nakokî hene. Lewra li gor Alîyev keyê Akamenid/Aşamenidê Kyrosê Mezin (Kîros/Kîr) ango kyrosê II. di sala B.Z. 550yî de dawî li desthilatdariya Meda tîne. B.Z. 558 jî, dîroka derketina ser text a Kyrosê II. e. (Alîyev, 1960, s. 190).

desthilatdariya Îskîtan jê derdixê, dibêje Medî 128 sal desthilatdarî kirine, ji aliyê din ve jî pêvajoya giştî ya desthilatdariya keyên Medan wekî 150 sal formûle dike (Herodotus, 2013, r. 60). Tê dîtîn ku her çendî di formulasyona Hêrodotos de nakokî hebin jî, di encamê de bi hîpoteza Dyakonov re li hev dike.

Wek ku li jorê jî hatiye zimên, wisa tê bawer kirin ku dewleta Med di bingeha xwe de ji 6 eşîrên mezin tê pê. Him Îgrar Alîyev û him jî Îgor Dyakonov li ser vê mijarê analîzên berfireh dikin. Li gor vê jî navên eşîrên mîna Boûsaî, Paretakenoî, Stroukhates, Arîzantoî, Boudîoî, Magoî sûtê werdigirin (Dyakonov, 2012, I, r. 162; Aliyev, 1960, r. 190).⁵

Wisa bawerî pê tînin, ku di nava van hêmanên navborî de bi taybet eşîrên mîna Paretakenoî û Arîzantoî bi awayekî aşkere xwedî etîmolojiyeke Îranî ne (The Geography of Strabo, 1961, r. 308–309). Bawerî pê tê anîn ku hêmana Paretakenoî bi giranî şênîyên herêma Îsfaxana îroyîn bûne. Ji bo hêmana Arîzantoî jî wisa tê bawer kirin, ku yek ji rahên Arîyan e. (Dyakonov, 2012, I, r. 162-163; Vîlçevskîy, 1961, r. 86).

Dema mirov li sînorên cografyaya dewleta Med dinêre jî, dibîne ku ji bakur ve ji Çemê Erezê heya Çiyayê Elbrûzê, ji wir ber bi Deryaya Hezarê ve dirêj dibe, ji rojhilat ve ber bi Deşta Kebîr ve (Çola Xwê ya Mezin) berfireh dibe (Dyakonov, 2012, I, r. 91). Ji aliyê rojava û başûr ve jî, rêzeçiyayên Zagrosan, welatê Medîyan dorpêç dikir. Ermenîstan, Gurcistan, Azarbaycan û çar parçe axa Kurdistanê ya îroyîn, di nav sînorên Medyayê de bûn. Di gelek çavkaniyan de xuya dibe ku paytexta Medan Ekbatana (Agbatana) bûye (Aliyev, 1960, r. 201).⁶

Ekbatana wek termînolojîk, tê wateya “ciyê kombûnê, fûarê”. Wisa tê zanîn ku navê Ekbatana yê îro Hamadan e, ku di nava sînorên Îranê de dimîne (Dyakonov, 2012, I, r. 198–199).

III. Med û krîza berbelavbûn û Hegemoniyê:

Desthilatdariya Keyê Medan Dêioces sala 700î ya B.Z.ve dest pê kirye, 53 sal ajotye û sala. 647an a B.Z kurê wî Fraort derketye ser text. Wisa tê ferzkirin ku navekî din ê Fraort jî Kaştarîtî ye (Aliyev, 1960, r. 229). Yek ji kiryarên balkêş ên desthilatdariya Fraort jî têkoşîna desthilatdariyê ya li dijî Asûriyan e. Di wê serdemê de birayê Keyê Asûriyan Asûrbanîpal (Asurbanîpal/Aşurbanapal) Şamaşşumukîn li dijî wî serî hildabû. Fraort ji vê tevliheviya wan a navxweyî sûtê werdigire û sala 624an a B.Z. êrîşî Asûriyan dike (Struve, 1941, r. 367). Di vê êrîşê de Îskîtî, alîkariya welatê Asûriyan dikin û dibin sebebê kuştina Fraort (Struve, 1941, r. 367).

Piştî mirina Fraort, kurê wî Keyakser derdikeve ser textê bavê xwe. Kuştina bavê wî bi Keyakser re hêseka mezin çê dike. Loma, dawîlêanîna desthilatdariya Asûriyan ji bo Keyakser dibe mijara man û nemanê. Û sala 612an a B.Z. di êrîşeka mezin a li dijî paytexta Asûriyan Nînovayê de dawî li desthilatdariya Asûran anî (Piotrovskiy, 1954, r. 141-158). Lêkolînerê rûsî B.B. Pîotrovskîy dinivîse ku di vê êrîşa li dijî Asûran de, hinek yekîneyên Babîlê û Mandayên Ummanê⁷ jî alîkariya Keyakser kirine. (Piotrovskiy, 1954, r. 141-

⁵ Di wergera îngilîzî ya pirtûka Herodot de 6 eşîrên qala wan tê kirin ev in: “Busae, Paretaceni, Struchates, Arizanti, Budii, Magi” (Herodotus, 2013, r. 47).

⁶ Deioces piştî wekî key hat hilbijartin beriya her tiştî jî bo parastina xwe û pêanîna erkên keyaniyê pêdivî bi serayekê dît. Li ser vê yekê, gelê Medî di nav xwe de biryar didin û serayeka mezin û xurt didine avakirin. Paşê jî ji bo Deioces bajarekî bi sîberên bi zeraqe, dîwarên bilind û qewîn ava dikin. Navê bajar Agbatana bû (Herodotus, 2013, r. 46)

⁷ Koka Umman Mandayan hîn taybetmendiyêke kanonîk negirtiye. Li gor hin çavkaniyan Îndo-Europî ne ku ji bakur ber bi Asyaya Piçûk ve hatine. Di hin çavkaniyan de jî, wekî Medî derbas dibin. Li gor vê, tê zanîn ku Keyên Medan ên mîna Keyakser û Aştiyago di hin pelgeyan de wekî “Key û desthilatdarên Manda” têne binavkirin (Dandamayev û Glukonin, 1980, sr. 81); Oryantalîstê rûs Rus Basîl Nikîtin jî dinivîse ku Umman Mandayî “komeka ji eşîra Manda tê pê” ku Asûrî wan wekî Kimmer û Îskîtî binav dikin. Herwiha divê Umman Mandayî bi Medî û Mannayîyan re neyêne têkilkirin. (Nikîtin, 1964, r. 55).

158).⁸ Dawîlêanîna desthilatdariya Asûran ji bo ewlekariya Medan têrê nedikir. Lewre Îskîtî pêvajoya vî şerî ji bo xwe bikar tînin , Keyakser dikin binê nîrê xwe û li ser axa Medan 28 salan qanûnên xwe pêk tînin. (Struve, 1941, r. 367; Alîyev, 1960, r. 231).⁹

Welatê Medan hewl didan ji aliyekî ve wek şaxekî qanûnî yê Îskîtan hebûna xwe bidomînin, ji aliyê din ve jî, hewl didan axa xwe ber bi Asyaya Piçûk ve berfirehtir bikin. Herwiha artêşa Kîakser sala 590î a B.Z. êrîşê Urartuyan dike û dawî li desthilatdariya Urartuyan a li Tuşpayê tîne (Dandamayev û Glukonîn, 1980, r. 84). Lewre navendeka rêveberiyê ya Urartuyan jî li Başûrê Kafkasyayê Teîşebaînî'yê (Teşebanî/Karmîr-Blur) bû. Loma jî mijara ku Medî bi temamî dawî li desthilatdariya Urartuyan anîne, dibe sedema gengeşiyên mezin. Lêkolîner Pîotrovskiy ku li ser Îskîtan lêkolînên berfireh kiriye, dinivîse, ku bermayiyên li ser keleha Teîşebaînîyê hatine dîtin nîşan didin ku Îskîtan êrîşekê bi ser vê kelehê ve biriye. (Pîotrovskîy, 1954, r. 141-158). Dijberî Pîotrovskîy, Dyakonov angaşt pê dike ku dane û delîlên têrê bikin nînin ji bo bê gotin, ku Teîşebaînî jî aliyê Îskîtan ve hatiye berterefkirin. (Dyakonov, 2012, II, r. 30-31). Eger hîpotêza Pîotrovskîy weke bingeh bê girtin, wê demê derdikeve holê ku du dijminên hev li dijî Urartuyan hevkarîyeke "bêdil" kirine.

Di serdema Kîakser de yek ji dînamîkên derveyî yê ewlekariya Medan dikirine nav metirsiyê jî, bê guman, Lîdyayî bûn (Vîlçevskîy, 1961, r. 80). Di wê serdemê de Lîdyayî jî aliyê Alyattes (Alîatt) ve dihatine birêvebirin. Artêşên herdu aliyan di navbera salên 590–585 ên B.Z. de şer kiribûn (Dandamayev û Glukonîn, 1980, r. 85). Lewre di şerê de herdu alî jî serkeftineke temamî bi dest nexistin.¹⁰ 28ê gulana sala 585an a B.Z. de bi taybet jî bi hewldana Babîliyan peymanek tê îmzekirin û Çemê sor di navbera herdu aliyan de wek sînor tê pejirandin.¹¹ Heman salê Keyakser kiras guherandibû ango miribû.

Mijara Zerdeştîbûnê ya serdema Keyê Medan Keyakser, bê guman ku yek ji mijara ku herî berfireh û kûr tê nîqaşkirin e. Pirsra ku peyamber Zerdeşt kengî jîyaye û Avesta di kîjan salê de hatiye nivîsîn jî, li benda bersivêka ampîrîk e. Hinek lêkolînerên rûsî, hewl didin nezelaliya li ser vê mijarê zelal bikin. Li Îranê, li gor dîrokzanên faris bi gelemperî, koka Zerdeştî ango Mazdeîzmê xwe dispêre Akamenîdan. Wisa tê zanîn ku ev tîz bi giranî jî ji aliyê Sasaniyan ve hatiye honan (Struve, 1948, r. 5-34). Avakarên vê tîzê angaşt pê dikin ku Viştaspa ku navê wî di Avestayê de derbas dibe (Gustasp/Hystaspes [kesê Zerdeşt diparêze û olê li nav civakê belav dike) di rastiya xwe de satrapê herêma Baktrîayê (Bactria)yê ye ku li ser Akamenîdan e (Mamoyan, 2020, r. 25).

Lêkolînên ku di vê çarçoveyê de li Rûsyayê hatine kirin bi giranî ramana ku ev tîz ji "girêdana sedemîti (causality)"yê, bêpar e derdixe pêş. Dîrokzanê Sovyetî-Kurd Ezîzê Cewo (Mamoyan), tîza ku Avesta'yê bi Akamenîdan ve girê dide bi tundî red dike û dinivîse ku di Avestayê de navê tu rêveberê Akamenîdî derbas nabe (Mamoyan, 2020, r.

⁸ Di wê serdemê de xerabûna welatên Asûran ku wekî "hêlîna şêran" dihate nasîn û ketina bajarê Nînovayê ku wekî "bajarê xwînê" navdar bûbû, ji aliyê gelên rojhilat ve bi çoşeka mezin dihate xeyal kirin. Loma jî di nav eşîrên şênîyên herêmê û komik û derdorên hatibûne kolekirin de, çoşeka hevkarîyê bi pêş ketibû (Dyakonov, 2012, II, r. 8).

⁹ Basîl Nikîtîn jî angaşt pê dike ku Îskîtî di navbera salên B.Z. 643-615an de li Asyayê desthilatdarî ava kirine (Nikitin, 1964, s. 55).

¹⁰ Medî û Lîdyayî, li hêla Çemêsor (Halys/Alis) hatibûne hemberî hev. Lê heman rojê, roj tê girtin û ev rewş weke nîşaneyeka xudayî ya rewşeka neyinî destnîşan dike tê şirovekirin û her du alî dev ji şer berdidin. (Struve, 1941, r. 367-368).

¹¹ Dîroka peymanê navbera Keyakser û Alyattes mijareka ji nîqaşê re vekirî ye. Di analîza M.A. Dandamayev û V.G. Glukonîn de dîroka 28ê Gulana 584an a B.Z. derbas dibe. Lewre lêkolînerên mîna Dyakonov û Struve dîroka 28ê Gulana 585an wekî bingeh digirin. Bi peymanê jî aliyê her du aliyan ve hat îmzekirin re, bingeha zewaceka navbera kurê Keyakser Aştîyago û keça Keyê Lîdyayê Alyattes Arieniya hatibû avêtin. (Dyakonov, 2012, II, r. 34).

25). Dîsa lêkolînerê Sovyetê V.V. Struve jî, heman nêrînê diparêze. Keyên Akamenîdan Daryosê I. û kurê wî Serhasê I. (Kserkses/Xşayarşa), li gel ku xizmeteka mezin ji bo Zerdeştîyê kirine jî, navê wan di Avestayê de derbas nabe (Struve, 1948, r. 5-34). Bi heman şewazî Dyakonov jî wisa bawerî pê tîne ku ev têza Sasaniyan a tê zanîn li dijî kevneşopiya zanistê ye (Dyakonov, 2012, II, r. 97). Li gor hîpoteza Dyakonov ku jêderk ango koka Zerdeştîyê bi serdema Medan ve girê dide, di rolyefên li ser kêlikên Keyakser û kurê wî Aştiyago de rîtualên Mazdeîst tene dîtin (Dyakonov, 2012, II, r. 110). Dyakonov her wiha pêşdibîne ku Keyê beriya Keyakser Fraort bi xwe jî dikare Zerdeştî be û wisa bawer dike ku dîtinên W.B. Hennîng û yên El-Bîrunî bi pîvanên zanistî re têra xwe li hev nakin.

Wek ku tê zanîn, lêkolîner Hennîng angaşt pê dike ku, 258 sal beriya Îskenderê Mezin derkeve ser text (B.Z. 336), dikare Zerdeşt xwe gihandibe peyamberiyê (Hennîng, 1951, r. 38). Ev jî tê sala B.Z. 594an ku ev jî tê serdema Keyaniya Keyakser. Dyakonov li ser mijara sala peyamberiya Zerdeşt û nivîsîna Avestayê wisa bawerî pê tîne ku Hennîng di nav nezela û aloziyekê de ye, lê helwesta Dyakonov bixwe hêjayî nîqaşê ye. (Dyakonov, 2012, II, r. 109). El-Bîrunî jî di wê baweriyê de ye ku beriya damezirandina Împaratoriya Seleukos (Selefkos/Selevkos – B.Z. 312) bi 258 salan ango salên 570'yî ya B.Z. Zerdeştî derketiye holê. (Struve, 1948, r. 5-34).

Lêkolîner Ezîzê Cewo jî, di rêyeka ji ya Dyakonov cudatir re diçe. Ew bi gelemperî giranîyê dide ser belgeyên Ermenan. Ezîzê Cewo dinivîse, ku di serdema Keyê Medan Kîakser de Ermen ji Frîgyayê koçî Medyayê kirine û li Başûrê Kafkasan “bi cî bûne” (Mamoyan, 2020, r. 38). Ezîzê Cewo dide zanîn ku di çavkaniyên Ermenan de derbas dibe, ku Medî “Vistaspazun” ango peyhatî (nevîyên)Viştaspa (Vîstaspa) ne. Ezîzê Cewo di wê baweriyê de ye ku Viştaspa di rastiya xwe de “Kîaksar” e.¹² Ew di analîzên xwe de bi giranî ji analîzên dîrokzanê Amerîkî Richard N. Frye sûtê werdigire û wisa destnîşan dike, ku Zerdeşt di sala B.Z. 588an de Viştaspa anye ser bawerîya xwe (Mamoyan, 2020, r. 52). Li gor vê hîpotezê peyamber Zerdeşt, di navbera salên 630–553an ên B.Z. de jiyaye. (Mamoyan, 2020, s. 52).

IV. Çarenûsa Medya'yê

Polîtîkaya împeryal di serdema Kiakser de derketibû asta here bilind. Ev serdem, li gor hin nivîskaran sala 585an a B.Z. û li gor hinek nivîskaran jî sala 584an a B.Z. bi dawî bûye.¹³ Kurê wî Aştiyago ket şûna wî (Struve, 1941, r. 368). Di serdema Aştiyago de dest pê kiribû dînamîkên hundirîn û yên derveyî diguherîn. Li Asyaya Piçûk weke berê êdî di navbera hêzan de “mêzînek” tunebû (Alîyev, 1960, r. 249). Di navbera Babîllî, Lîdyayî, Medî û Misirîyan de têkoşîna desthilatdariyê her ku diçû geş dibû. Loma jî wisa tê bawer kirin ku Aştiyago nekariye polîtîkaya împeryal a ji Kîakserê bavê wî mabûye, baş pêk bîne (Alîyev, 1960, r. 249). Di dema wî de rewşa giştî ya nav welêt jî tê guhartin. Tê zanîn ku di navbera serokeşîr ango xanedanan û Aştiyago de aloziyeke çînayetî dabû der û rêveberiya navendî ji vê yekê pir bi bandor dibû (Alîyev, 1960, r. 249).

Herçendî di serdema Aştiyago de siyaseteka xurt a “serkeftinî” nehatibe pêkanîn jî, tê zanîn ku li dijî Babîlan têkoşîna desthilatdariyê daye. Di rastiya xwe de, di serdema Keyakser de Babîlî hêzeka hevkar bûn. Lê piştî Aştiyago welatê Êlam kir bin

¹² Li gor hîpoteza Ezîzê Cewo ku dinivîse Viştaspa jî wekî terminolojîk tê wateya “çar, desthilatdar”, Keyakser, hêjayî bernavê Kavî Viştaspa hatibû dîtin. Keyakser ku ax da Ermenên ji Frîgya'yê hatibûn û dewleteka Ermen da damezirandin, di nav Ermenan de wekî sembola gelê Med û remza xanedaniyê dihat dîtin û binavkirin. Ermen di vê çarçoveyê de Medan wekî nijada Keyakser, ango wekî “Vistaspazun” dane şayesandin (Mamoyan, 2020, r. 75).

¹³ Di xebata Dandamayev û Glukonîn de tê nivîsîn ku Keyakser di sala B.Z. 584an de miriye. Lê, nivîskarên mîna Ezîzê Cewo û Îgrar Alîyev dîroka B.Z. 585 destnîşan dikin (Dandamayev û Glukonîn, 1980, r. 85; Mamoyan, 2020, r. 135; Alîyev, 1960, r. 248).

desthilatdariya xwe, hevkarîya navbera herdu hêzan veguhezî neyariyê (Dandamayev û Glukonîn, 1980, r. 85). Bi taybet piştî mirina Keyê Babîlê Nebukadnezarê II. “tevlîheviya” 6 sale, ji aliyê Aştiyago ve wek fersendekê hatibû bikaranîn (Alîyev, 1960, r. 250).

Paşê, di serdema Keyê dawîn ê Babîlê Nabonîdus (Nabu-Na'id) de, şerê navbera Medan û Babîlan gur bûbûye. Wisa tê bawer kirin, ku di vî şerî de rêveberîya Aştiyago pir lawaz bûbû û ev rewş bûbû hêviyek ji bo aktorên hundirîn û derveyî yên dixwestin dawî li desthilatdariya wî bînin (Alîyev, 1960, r. 251).

Di vê çarçoveyê de, Harpagosê ku di seraya Aştiyago de xwedî berpirsariyên bilind bûye, li gel hin serokeşîran li dijî Aştiyago amadekariya serîhildanekê dikirin (Alîyev, 1960, r. 253). Lê hêza wan têre nedikir ji bo daxistina Aştiyago. Loma jî rê li ber serîhildana xanedaniya Kyûrosê II. (Kyûrosê Mezin [Kyros]) vekirin (Alîyev, 1960, r. 253). Kyûrosê II. di heman demê de kurê Mandaneya dota Aştiyago bû, ango nebiyê Aştiyago bû. Mandane bi Keyê Persan Kambîsesê I. (Cambyses) re zewicandî bû (Dyakonov, 2012, r. 63-64). Di encamê de, sala 553an a B.Z. di navbera Medan û Persan de şer rû da. Di encama şerê nêzî 3 salan de Pers bi ser ketibûn (Struve, 1941, r. 368). Di vî şerî de kompoyên di artêşa Medan û arîstokrasîyê de mora xwe li encamê xistibûn. Wisa tê zanîn ku di vî şerî de beşek ji artêşa Medan derbasê aliyê Persan bûne û bi taybet jî milê artêşê yê di bin fermandariya Harpagos de Medan derbeyên mezin xwarine (Alîyev, 1960, r. 254). Êrîşa Harpagos a li dijî Aştiyago, wek “xiyanet” ketiye dîroka medan. Di encamê de, sala 550yî a B.Z. dawî li hebûna dewleta Med hatiye (Minorskiy, 2013, r. 206-211).¹⁴ Li ser heman axê, serdema xanedaniya Akamenî a Persan dest pê kirîye. Lê navê “Medya”yê, piştî jî wek cografîk hatiye bikaranîn. Wek mînak, dewleta Atropatenayê di heman demê de bi giranî wek Medyaya Piçûk, ango Medya Atropatênî dihate navkirin û gotin (Nikitin, 1964, r. 54).

V. Medî û Kurd

Binyata nîjadî ya Medan, di nav derdorên akademîk de salên dirêj bûye sedema gengeşîyan. Tê zanîn ku li ser axa Med lê destilatdar bûne îro bi giranî kurd dijîn. Ji ber vê yekê jî, pîrsa ku Kurd di bîngeha nîjada Medan de roleka çewa lîstine bala gelek lêkolîneran kişandiye. Di hin lêkolînên serdema Rûsyaya Çarîtiyê û Yekîtiya Sovyetê de, hewl hatine dayîn ku bersîveka êmpîrîk ji vê pîrsê re bê dîtin.

Teza ku Medî prototîpeka kurdan e, li Rûsyayê di hin xebatan de tê dîtin. Bi gelemperî wisa tê bawer kirin ku ev teza ya V.F. Mînskîy ye. Lewre wisa bawerî pê tê anîn ku beriya Mînskîy li Rûsyaya serdema Çarîtiyê ev mijar ji aliyê Xaçatur Abovyan ve hatiye lêkolîn. Abovyan, di sala 1848an de ji bo rojnameya Kavkaz gotarekê dinivîse û dibêje ku Kurd bi reha xwe Medî ne (Abovyan, 1848, r. 184). Ew, dîrokzanên ermen ên wek Çamşîyan û Încînçyan ji vê angaştê xwe re dike palpişt. Abovyan dide zanîn ku demeka dirêj çavkaniyên ermen bi peyva “Mark” qala Medan dikin. Herwiha Abovyan dide zanîn, ku di serdema Keyaniya ermenîyan a Bagratunî (885-1045) de êdî gotina “Kurd” derdikeve pêş (Abovyan, 1848, r. 184).

Di serdema vê keyaniyê de herêma kurd lê bûn weke “Kordîk” an jî “Kord” dihate navkirin (Abovyan, 1848, r. 184).¹⁵ Li ser vê bîngehê Abovyan di vê gotara xwe ya

¹⁴ Artêşa Pers paytext Ekbatana'yê bi dest xistibû, bajar talan kiribû û beşek ji gel kiribû kole. Li gor agahiyên dîrokzanê Yûnanî Ctesias dide, Aştiyago di vê navberê de li Ekbatanayê xwe vedişart. Kîrosê II li bajêr qîza Aştiyago Amîtîda û mêrê wê Spîtama desteser kiribû. Herwiha ferman dabû ku li herduyan û li zarokên wan Spîtak û Megabern îşkence bê kirin. Armanca wî hînbûna ciyê Aştiyago xwe lê veşartîye bû. Aştiyago ku nedixwest qîza wî û nebiyên wî bi îşkenceyê re rûbirû bimînin, xwe radestî Kîrosê II kir (Dyakonov, 2012, r. 142-143; Dandamayev, 1985, r. 273-274).

¹⁵ O.L. Vilçevskiy jî li ser bêtîya “Kordîk” radiweste (Vilçevskiy, 1961, r. 66).

navborî de agahiya dîrokzan Çamçyan vediguheze, ku kurd di serdema keyaniya Bagratunî de li Paşatiyên mîna Wan, Mûş û Bilîsê dijîyan (Abovyan, 1848, r. 184). Divê bê zanîn ku Çamçyan di vê xebata xwe ya navborî de Kurdan û Medan wek heman nîjadî destnîşan dike (Abovyan, 1848, s. 184).¹⁶

Yek ji lêkolînerên têza ku nîjada Kurd wek prototîpeka Medan formule dikin jî bê guman ku Minorskiy e. Ev mijar beriya her tiştî, di gotara Mînorskîy ya bi sernavê “Kurdu: Zametki i Vpechatleniya (Kurd: Not û Çavdêrî)” ya di sala 1915an de hatiye weşandin de kême be jî hatiye ziman. Di vê gotarê de tê nivîsîn ku kurd mîratgirên Medan in û di zimanê kurdî de gelek hêmanên zimanê Medî hene.¹⁷

Mînorskîy li ser girêdana dîrokî ya navbera Kurd û Medan salên piştê jî lêkolîn û lêpîrsînên xwe didomîne û lêkolînen xwe bi gotarekê û bi kurtî hewl dide teorîze bike. Kopyeyeka gotarê ya bi daktîloyê hatiye nivîsîn jî, di sala 1958an de ji kurdolog Kanat Kurdojev (Qanadê Kurdo) re tê şandin ku li Lenîngradê bûye. Mînorskîy di vê gotarê de bi giranî sûtê ji agahiyên dîrokzanê Ermen Moses Xorenatsî (410-490) digire. Xorenatsî dinivîse ku ew Kurdan wek nebiyên Medan dibîne (Mînorskîy, 2013, r. 206-211). Mînorskîy di heman gotarê de wek nîşaneyê têkiliya navbera Medan û Kurdan, li ser demografi û etîmolojiya bajarê Îranê “Maku”yê radiweste. Ew wisa dinivîse ku li navçeya Dambat a bi ser Maku’yê ve bi sedê salan e kurd dijîn û populasyona vê derê dikare heya serdema Medan jî here (Mînorskîy, 2013, r. 206-211). Mînorskîy her wiha li ser etîmolojiya Maku’yê kûr dibê û li gor hîpoteza wî, ev gotin ji *mah* û *kuh* tên pê, pênameya “mah” jî, formeka cuda ya gotina “Med” e (Minorskiy, 2013, ss. 206-211).

Rojhilatnas Basîl Nîkîtîn jî, hîpoteza Mînorskîy destek dike. Bi taybet jî, ji ser anatomiya bêjeya “Kurmanç” nêrînên Mînorskîy vedibêje û hewl dide bi hîpoteza heyî re bike yek. Wek ku tê zanîn, Mînorskîy nasnameya Kurmanç ji aliyê termînolojîk ve wek senteza Kurtî û Mardî dibîne (Nîkîtîn, 1964, r. 57).¹⁸ Nêrîneke berfireh a giştî ye ku ev herdu hêman, ji hêmanên avakarên Medan in û zaravayên Medan diaxivin. Bi taybet jî pêşiyên Mardan û Mannayan in û bi Medan re têkiliyeke wan a yekser heye (Nîkîtîn, 1964, r. 57-58).

Dewleta Med, a ku 150 salan desthilatdar bûye, bi Asûrî, Îskîtî, Lîdyayî, Babîlî, Persî û hwd. re têkiliyên curbecur daniye. Dîroka Medyayê ku salên dirêj wek “*terra incognita*”, ango welatê nayê zanîn bû, di sedsalên XIX. û XX. de li Rûsyaya serdema Çar û di serdema Yekîtiya Sovyetê de bi berfirehî hatiye lêkolîn. Di dema van lêkolînan de bi taybet jî dîroknasên Yûnanî, Babîlî û Ermen ên wekî Herodot, Ktesîas, Berossus, Strabon, Movses Xorenatsî wek çavkanî hatine girtin. Li gel van, rolyef, nivîstek, gor, tablet, bermayiyên dîwarên keleşan ên derbarê wê serdemê de jî, hatine lêkolîn. Di beşeke van lêkolînan de gihîştine wê encamê, ku di navbera Medî, Zerdeştî û Kurdan de “korelasyon”ek heye. Daneyên nû yên di pêşerojê de bêne bidestxistin, bê guman dê vê mijarê bêhtir rohnî bikin.

¹⁶ Li ser vê mijarê dikare mînakên cuda bê dayîn, wekî li gor agahdariya Celîlê Celîl dide, nivîskarê Ermen G.V. Sravantzyanz, di sedsala XIX. de, di vegotina xwe ya Mîrza Axa de li şûna bêjeya Kurd, bêjeya “Med” bi kar dihanî (Celil, 2007, r. 14).

¹⁷ Hêjayî gotinê ye ku li Tirkiyeyê gotar ci bi ci şaş tê wergerandin. Mînak di berhema bi navê “Kurd” de ku di sala 1977an de ji aliyê Weşanên Komal ve hatiye çapkirin, tê nivîsîn ku Ermen navê “Kortçya” li Kurdistanê kirine. Lê di orjînalê gotarê de Mînorskîy bêjeya “Kortçya” bikar tîne. Di vê pirtûkê de pir caran nêrînên Mînorskîy hatine nepixandin, an jî şaş hatine teyisandin (Minorskiy, 1915, ss. 189-231).

¹⁸ Tê zanîn ku her wekî Mînorskîy, Marr jî di navbera zimanên ji famîla Kurdî û zimanê Medî de hin girêdanên lînguîstî destnîşan kirine (Nikitin, 1964, r. 61; Vilçevskiy, 1961, r. 76).

Çavkanî:

- Abovyan, X. (1848). Kurdy (Kurd). Kavkaz”, 46, 184.
- Aliyev, I. (1960). Istoriya Midii (Dîroka Medya) I, Baku: Izdatel'stvo Akademii Nauk Azerbaydzhanskoy SSR.
- Avdiyev, V.I. (1970). Istoriya Drevnego Vostoka (Dîroka Kevnar a Rojhilat). Moskva: Izdatel'stvo “Vysshaya Shkola”.
- Celîl, Celîlê. (2007). Di Dîroka Gelê Kurd de 13 Rûpelên Balkêş. (Hasan Kaya, Wer.). Stembol: Evrensel Basın Yayın. (2002).
- Dandamayev, M.A. (1985). Politicheskaya Istoriya Akhemenidskoy Derzhavy (Dîroka Siyasî ya Akamenîd), Moskva: Izdatel'stvo “Nauka”.
- Dandamayev, M.A. ve Glukonin, V.G. (1980). Kul'tura i Ekonomika Drevnego Irana (Çand û Aboriya Kevin a Îranê). Moskva: Izdatel'stvo “Nauka”.
- Dyakonov, I.M. (2012). Istoriya Midii (Dîroka Medya), Baku, I: Nagyl Evi.
- Dyakonov, I.M. (2012). Istoriya Midii (Dîroka Medya), Baku, II: Nagyl Evi.
- Henning, W.B. (1951). Zoroaster: Politician or Witch-doctor? (Zerdeşt: Siyasetmedar e an Sêrbaz e?), London: Oxford University Press.
- Herodotus. (2013). The Histories (Dîrok), (George Rawlinson, Wer.). Moscow: Roman Roads Media. (1502).
- Mamoyan, A.D. (2020). Prorok Zaratushra po Stranitsam “Poteryannoy” Istorii (Zerdeşt Pêxember – Rûpelên Dîroka Widabûyî), Moskva: Izdatel'stvo “Pero”.
- Marr, N.Y. (1933). Izbrannyye Raboty (Berhemên Bijare). Leningrad, I: Izdatel'stvo GAIMK.
- Minorskiy, V.F. (1915). Kurdy: Zametki i Vpechatleniya (Kurd: Not û Çavdêrî). Izvestiya Ministerstva Inostrannykh Del, 3, 189-231.
- Minorskiy, V.F. (2013). Kurdy — Potomki Midyan (Peyrewên Medan Kurd). Pis'mennyye Pamyatniki Vostoka, 1 (18), 206-211.
- Nikitin, B. (1964). Kurdy (Kurd). (I.O. Farizova, Wer.). Moskva: Izdatel'stvo “Progress”.
- (1956).
- Piotrovskiy, B.B. (1954). Skify i Drevniy Vostok (Îskîfî û Rojhilata Berê). Doklad na Konferentsii po Skifo-Sarmatskoy Arkheologii. Sovetskaya Arkheologiya, XIX, 141-158.
- Struve, V.V. (1941). Istoriya Drevnego Vostoka (Dîroka Rojhilata Kevin), Moskva: Gospolitizdat.
- Struve, V.V. (1948). Rodina Zoroastrizma (Welatê Zerdeştîyê). Sovetskoye Vostokovedeniye V, Moskva: Izdatel'stvo Akademii Nauk SSSR, 5-34.
- The Geography of Strabo (4. bs.). (1961). (Horace Leonard Jones, Wer.). London, V: William Heinemann Ltd. (1928).
- Vilçevskiy, O.L. (1961). Kurdy: Vvedeniye v Etnicheskuyu Istoriyu Kurdsogo Naroda (Kurd: Destpêka Dîroka Nîjadî ya Gelê Kurd). Moskva-Leningrad: Izdatel'stvo Akademii Nauk SSSR.

Gotar bi zimanê tirkî di hejmarê 8em a kovara “Kürd Araştırmaları Dergisi” de hatye weşandin – rûpel: 35 – 45

Werger – AmidaKurd